Şopdara Rastiyê ye
Ronahî
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :1288 | 9-Tîrmeh-2025 | www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
rojnameyaronahi
@ronahikurdi55
nameronahi@gmail.com
Rojnameya Ronahî
+963 984 370 218

# 5’emîn Pêşbirka Nivîskarên Pêşerojê

**Zana Roj/Qamişlo**

**Di bin dirûşmeya “Şitlên îro, darên sibê ne” Desteya Çand û hunerê ya Kantona Qamişlo 5’emîn Pêşbirka Nivîskarên Pêşerojê ya Zrokan li dar dixe. Endamê Komîteya Amedekar a Pêşbirkê Ebdilmecîd Xelef wiha got: “Armanca me avakirina nivîskarên pêşerojê ye”.**



Bi mebesta gihandin û avakirina nivîskarên pêşerojê yên ku bibin pêşengên siberojê, xebatên girîng yên huner, wêje û nivîsandinê li Bakur û Rojhilatê Sûriyê tên lidarxistin. Ji 5 salan ve Pêşbirka Nivîskarên Pêşerojê ji aliyê Desteya Çand û Hunerê ya Kantona Cizîrê ve tê lidarxistin. Dewreya 5’emîn jî dest bi ragihandina pêşbirkê kiriye. Her wiha wê pêşbirk li ser çend qonaxan dabeş bibe û wê nêzî meh û nîvekê dirêj bike heyanê bighêje encamê. Têkildarî vê mijarê Endamê Komîteya amedekar a Pêşbirkê Abdilmecîd Xelef ji rojnameya me re axivî.

### Organîzekirina pêşbirkê




Ebdilmecîd di destpêkê de behsa organîzekirina pêşbirkê kir û wiha got: “Pêşbirka nivîskarên pêşerojê ya zarokan ev bû 5 sal in tê lidarxistin, tenê salekê nehat amedekirin ji ber belavbûna nexweşiya Koronayê. Beriya hefteyekê rêklama wê hat ragihandin da ku em zarokan pêşwazî bikin. Pêşbirk ji sê qonaxan pêk tê, destpêkê me deriyê tomarkirin û pêşwazîkirina zarokan kir, piştre wê pirtûkên çîrokan li ser zarokan bên belavkirin, ew pirtûk jî li Qamişlo tên amedekirin û li hemû bajarên kantonê wê belavbibin. Herwiha wê di qonaxa duyemîn de zarok bi devikî tiştên ku ji wan pirtûkan naskirin û têgihiştine ji komîteyê re vebêjin, da ku em asta têgihiştina wan bi riya çîrokan nas bikin û piştî deh rojan wê her yek tiştê ku ji wan berheman naskirine bi rengekî nivîskî deynin. Qonaxa sêyemîn em wan dibin cihekî geştiyariyê li wir hin çalakî tên lidarxistin û wê her yek çîrokekê ji xeyalên xwe amede bike.

Temenên ku em pêşwazî bikin ji 10 heyanî 14 û ji 15 heyanî 18’a ye, her wiha ew çîrok li gorî asta wan hatine amedekirin da ku zehmetiyan nekşînin. Di dawiyê de wê pileyên her sê qonaxan komî hev bibin û li gorî jêhatiyên wan kesên serkeftî diyar bibin. Her wiha pêşbirk bi sê zimanan tê lidarxistin wê ji her beşekê sê zarok biserbikevin”.

### Wê hemû zarok werin xelatkirin

Ebdilmecîd da zanîn ku wê hemû zarok bêne xelatkirin û wiha domand: “Piştî ev her sê qonax bi dawî bûn û 9 kesên serkeftî hatin hilbijartin, wê bi şahiyekê werin xelatkirin. Lê belê wê hemû beşdarvan werin xelatkirin ne tenê kesên ku bi ser ketine. Ji ber ger îro zarokek hewildana xwendin û nivîsandinê dike, ev ji bo me serkeftina herî mezin e. Xelatên me jî wê berhemek û pirtûkxaneyek ji 10-15 pirtûkan pêk tê û qirtasî be. Di heman demê de armanca me ne xelatên madî ne, lê wê bi rengekî sembolîk miqdareke madî jî hebe”.


### ‘Avakirina nivîskarên pêşerojê’

Ebdilmecîd bal kişand ser armanca wan ji vê pêşbirkê û wiha axaftina xwe qedand: “Her çendî civak bi xwendin û nivîsandinê bê perwerdekirin, ewqas wê di pêşerojê de bibe xwedî rol. Dawiya xwendin û zanebûnê nîn e, ji lewra jî divê ev zarok ji niha de dest bi xwendinê bikin, mijar çi dibe bila bibe, helbet di dawiyê de wê sûd ji bo wan be. Armanca me ya sereke avakirina nivîskarên pêşerojê ye ku bi tayebt di dema betlaneya dibistanan de em vê çalakiyê çêdikin, da ku bi tiştên vala re mijûl nebin û bikaribin vê betlanê di tiştên sûdemend de bikarbînin. A herî girîng jî ku ev nifşên nû li ser bingehên rast werin perwerdekirin û bibin deng û nameya gelê xwe ji hemû cîhanê re”.

# ‘Romana Xewnên Şiyarî êşa hemû Kurdan vedibêje’

**Reşo Mihemed/ Qamişlo**

**Romana nivîskar Ebas Ebas ya bi navê Xewnên Şiyarî li HRRK’ê hat îmzekirin. Ebas Ebas da zanîn ku romana wî bi bergê duyem hat çapkirin û got, “Romana Xewnên Şiyarî çîroka gelê Kurd li hemû Kurdistanê vedibêje.”**



Ebas Ebas nivîskarekî Kurd e, 52 sal in ku di warê roman, kurteçîrok û nivîsên şanoyî de karên nivîsandinê didomîne û dikarîbû 16 berheman biafrîne. Herî dawî karîbû hejmara berhemên xwe bike 17 û romana xwe ya bi navê Xewnên Şiyarî ya çapa 2’emîn bi 150 rûpelî bi Kurdiya Kurmancî li Qamişlo derxîne.

### Amadekirina wê

Ebas derbarê amadekirina romana xwe de wiha got: “Ji sala 1996’an ve min romana Xewnên Şiyarî nivîsiye, du çapên wê hene, çapa yekem di sala 2004’an hate çapkirin, lê min gelek guhertin tê de çêkirin, herî dawî da ku li Rojava jî ev berhem were peydakirin, min îsal ev berhem li Qamişlo çap kir.”

### Çîroka romana Xewnên Şiyarî

Nivîskar Ebas Ebas têkildarî çîroka romana xwe wiha bi lêv kir: “Romana min çîroka inkarkirin, şoreş û êşa gelê Kurd li her çar parçeyên Kurdistanê vedibêje. Çîrok li Girê Mîra yê girêdayî Nisêbînê rû dide, li ser sê xortên Kurd û xewnên wan e. Wan şevbuhêrkên xwe bi xewna gihaştina Ewropayê diqedanin, lê derfet ji bo hemûyan çênebû. Xortek jê daxwaza wî ew e ku bigihêje Ewropa, piştî demekê digihêje wir, bi jineke Elmanî re dizewice, welatê xwe ji bîr dike û tê kuştin, yê duyem kurê muxtar e, şûna bavê xwe digire û dawiyê ji ber têkiliyên cinsî tê kuştin. Xewna xortê sêyem jî ew bû ku bibe şoreşgerek di Partiya Karkerên Kurdistanê de, ew kurê dayikeke normal û hejar bû, xewna wî pêk tê û tevlî xebatê dibe û ev xebat tê domandin. Çîrokên dirjê bi sê xortan re çêdibin, lê min bi kurtasî xewnên xortan û encamên romanê anîn ser ziman.”

Bi kamîreya Birûc Resûl



Kampa Newroz

## FERHENGA BIWÊJAN

**LI SER LEZ Û ZÛBÛNÊ**

**Bablîsok e:**
- Sivik e; beza ye.

**Berfa nava avê ye:**
- Xwe nagire; demeke dirêj li ber xwe nade.

**Berî gavekê:**
- Pir bilez; pir zû.

**Bêhnbirhayî hat:**
- Dema wî tinebû ku xwe amade bike.

**Bêhnçikayî hat:**
- Bi heman wateyê.

**Bi bayê bezê hat:**
- Kesên di karê xwe de pir lezê dikin ji bo wan tê gotin.

**Bi piyê paşî ez vegeriyan:**
- Ez pir zû vegeriyam; ez nesekinîm.

**Bîsteke din:**
- Di demeke pir kurt de.
Bû gur heft gotlik jî xwarin.
- Ji bo kesê zû mezin dibe, yan zû dewlemend dibe, yan zû pêş dikeve tê gotin.

**Bû tîr çû:**
- Pir bilez çû.

**Çok şkandin:**
- Pir lezand.

**Destê xwe sivik kir:**
- Xweş xebitî; bilez xebitî.

**Heta tu bêjî bîst:**
- Di demeke pir kin de.

**Heta tu çavê xwe bigirî û vekî:**
- Bi heman wateyê.

**Ji çokan ket:**
- Pir lezand.

**Li ser stiriyan e:**
- Pir bilez e; pir lezê dike.

**Li ser sêla sor e:**
- Karê wî pir bilez e; sebra wî nayê.

**Lingê xwe sivik kir:**
- Lezand.

**Ma hawar bû/ma hawar e:**
- Te çima lez kir; tu çima dilezînî? (Dema ji bo çûna cihekî, kirina karekî, yan gotinekê yek lezê dike hingê jê re tê gotin)

**Ma roj ketine ciwalan?**
- Roj pir in; pêwîst nake em lezê bikin; li pêşiya me dem pir e.

**Ma tu li ser derziyê rûniştî yî?**
- Tu çima wisa lezê dikî.

**Nehişt em riya ber piyê xwe bibînin:**
- Hingî lez kir/hingî kir qîreqîr me nizanî ka çi bikin.

**Rûnişt rûnenişt, çû neçû, gihat wir negihat wir...:**
- Pir bilez.

**Tu dibêjî qey ji nexweş re çûye berfê:**
- Pir lezê dike.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

# ‘Hêzên navdewletî li gorî berjewendiyan têkiliyan bi Şamê re dikin’



Serokê Navenda Kurdên Bêsînor Kadar Pîrê anî ziman ku hemû hêzên navdewletî li gorî berjewendiyên xwe danûstandinan bi hikumeta Veguhêz a Şamê re dikin û got, “Rewşa gelên Sûriyê wê xerabtir bibe, pêwîst e sîstema navendî were şikandin û sîstemeke demokrat ku mafê hemû kesî biparêze, ava bibe.”**R-5**

# ‘Serxistina pêvajoya‘Aştî û Civaka Demokratîk’ erkê hemû Kurdan e’




Endamê Meclisa Edaletê ya kantona Cizîrê Nûredîn Şakir diyar kir ku kampanya “Ez dixwazim bi Abdullah Ocalan re hevdîtinê bikim” hêdî hêdî li tevahî cîhan û Kurdistanê belav dibe, tê xuyakirin ku ev kampanya pêşveçûneke mezin çêdike.**R-4**

Şopdara Rastiyê ye
Ronahî
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 1288 | 9-Tîrmeh-2025 | www.ronahi.net/ku/ | Nirx: 500 L.S

# BI HIŞMENDIYA KOMKUJIYAN WÊ SÛRIYÊ PARÇE BIBE

Piştî hilweşandina rêjîma Baas, hêviya avakirina Sûriyeke demokrat ku mafê tevahî gelan tê de parastî be, di dilê gelên Sûriyê de mezin bû. Lê bi hatina HTŞ'ê li ser desthilatdariyê ev hêvî pêk nehat. HTŞ'ê ji destpêka hatina ser desthilatdariya Şamê ve dest bi kiryarên dijmirovî wekî kuştin, revandin tecawizkirin û qirkirinan kir. Herwiha li dijî gelên Sûriyê komkujiyên bêserûber pêk anî. HTŞ'ê ne tenê li dijî mirovan di heman demê de li dijî xwezayê jî qirkirinê dike. Komkujiyên HTŞ'ê û bêdengiya navdewletî berê Sûriyê didin parçebûnê. **R-3**



## Şerê Taybet stûnên civakê, jin û ciwanan dike hedef



Di dîrokê de qurbana yekem a Şerê Taybet jin e, ji neolîtîkê heta roja îro jin hertim wek amûreke Şerê Taybet hatiye bikaranîn. Dewleta Tirk bi rêbazên tacîz, tecawîz, madeyên hişbir û bi polîtîkayên qirêj vê yekê dimeşîne. Armanc jî ew e ku civakê asîmîle û bê bertek bihêle.**R-2**

## ‘Ji ber kêmbûna baranê berhemên çandiniyê kêm bûn’



Xwediyên bexçeyên sebzeyan yên bajarê Qamişlo, cotkar û karkerên ku di bexçeyan de kar dikin diyar kirin ku kêmbûna baranê ziyaneke mezin gihand tevahî cûreyên çandiniyê, ji ber wê berhemên îsal yê sebzeyan jî pir kêm bûn.**R-6**

## ‘Çand û huner bingeha nasnameya mirovî ye’



Hevseroka Desteya Çandê ya Kantona Cizîrê Firyal Çolî bi bîr xist ku rola paradîgmaya Rêber Apo ya Netewa Demokratîk asta çalakiyên hunerî xurt dike û got, “Pêwîst e parastina çand û hunera hemû pêkhateyan were kirin.”**R-7**



Hişmendiya HTŞ`ê ji bo jinê xeter e
Nehîr pale R-2


Bûyerên li dijî pêkhateyên Sûriyê, plankirî ye!
Dilyar Cizîrî R-4


Divê têkoşîna demokrasiyê xurttir bibe
Zekî Bedran R-5


Hewldanên Bêrûmetkirinê
Farûk Sakik R-5


Çima Zagona Çapemenî û Weşanê li herêmê nîn e
Kemal Necim R-7

# Şerê Taybet stûnên civakê, jin û ciwanan dike hedef

Di dîrokê de qurbana yekem a Şerê Taybet jin e, ji neolîtîkê heta roja îro jin hertim wek amûreke Şerê Taybet hatiye bikaranîn. Dewleta Tirk bi rêbazên tacîz, tecawîz, madeyên hişbir û bi polîtîkayên qirêj vê yekê dimeşîne. Armanc jî ew e ku civakê asîmîle û bê bertek bihêle.

**Amara Baran/Qamişlo**

Polîtîkayên Şerê Taybet her ku diçe li Kurdistanê zêde û kûr dibe. Ji polîs û leşkeran fihûş û bikaranîna madeyên hişbir tê xwastin. Bi vê politikaya heyî jin û ciwan ji çand û nasnameya xwe dûr dikevin. Dewleta Tirk binkeftina şerê çekdarî bi şerê taybet dixwaze serkeftinê qazanc bike. Di sîstama kapîtalîst de kesên ku pêşengtî ji civakê re dikin, dibin armanca sereke a pergalê. Ji lewra beden û îradeya jin û ciwanan dike hedef ku jiyanekî bê rûmet bijîn û bibe sedema hilweşandina civakê. Ger em bala xwe bidinê di Tirkiyê de gelek tecawîzkarên ku destdirêjî li ser jin û zarokan dikin bê ceza dimînin.

### Şerê Taybet di bin navê azadiyê de civakê ji çanda wan dûr dixe


Civaka ku bi salane di nav qalibên Feodal û Dogmatîzmê de hatiye fetisandin, kapîtalîzm di bin navê azadiyê de civakê ji ehlaq û cewherê civakbûnê dûrxist. Dewlet ji bo ku civakê li gor berjewendiyê xwe bide sazkirin amûrên ku Şerê Taybet herî zêde li ser dixebite wekê sex, spor û sanat dide pêş. Rêzê fîlmên ku îro di qanalên Tirkan de derdikevin di wir de jî tê dîtin ku çiqas jin hatiye kolekirin, jinê kiriye dijminê jin û rolên xirab aîdê jinê kirine. Dewleta Tirk bi polîtîkayên xwe yên qirêj dixwaze derba giran li stûnên civakê ango jin û ciwanan bixe û dîl bigre. Dîlgirtina Jin û Ciwanan tê wateya Dîlgirtina tevahiya civakê yên ku herî zêde xwedî rolên ew herdûne. Dewlet li Kurdistanê civakê xistiye çerxereya kapîtalîzmê û dizivirîne, di bin navê azadiyê de dadiqurtinê hest û mêjiyên wan kiriye aîdî xwe, wek pêşkeşvanê azadiyê dide nîşandayîn. Ciwanên ku xwedî hêza avakirin û herikîna civakê ne, bûne wek amûrekî xirabkirin û hilweşandina civakê.


### Dewleta Tirk polîtîkayên qirkirinê li ser bedena jin pêk tîne

Li kurdistanê jina ku îro pêşengtî ji civakê re dike Dewleta Tirk bi xistin û karanîna jin polîtîkayên Şerê Taybet tacîz, tecawûz û madeyên hişbir (Fihûş) li Kurdistanê asayî dike. Taybet ew şerê ku tê meşandin li Kurdistanê pêk tînin. Her ku jin li Kurdistanê hêza xwe mezinkirin êrişên ser wan jî mezin bûn. Dewletên desthilatdar û taybet jî dewleta Tirk ji bo ku vîna jina Kurd bişkîne polîtîkayên qirkirinê li ser bedena û nasnameya jinê zêdekir. Desthilatdar ji bo ku nirxên çandî yên civakî tune bike êrişên tunekirina civakî bi polîtîkayên qirkirinê pêk tîne. Hemû rayadarên dewletê ji bo ku civakê ji çand û nasnamaya wî dûr bixwe di nav wî şerê qirêj de cîh digrin. Bi ketina jinê re civak jî hildiweşe û tune dibe. Ev jî pir eşkere derdikeve holê ku yên ku wan kiryarên qirêj pêk tînin; ne tên girtin ne jî tên darizandin ji ber ku Dewlet li pişta wane. Li Kurdistanê sedema xwe kuştin û întîharên jinan ji ber destdirêjiya zilam û dewletê ye.

### Jin û Zarok rastê kiryarên tecawîzê tên

Desthilatdarî bi dewletên kûr û veşartî dewleta çete û bi mafyayan re şerekî berfireh ji bo helandina Kurdan destpêkirin. Li gelek bajarên kurdistanê ji bo ku dizî,





fihûş û tiryakên bi tehlûke zêde bike, hemû derfetên xwe seferber dike û êrişekî bi plan û rêxistinkirî pêk tîne. Taybet di wan êrişan de hedefa yekemîn a Dewleta Tirk jin û ciwanin ji bo ku bi encam bibe bi mîlyaran pere tên xerçkirin û deh hezaran xebatkarên Şerê Taybet tên amadekirin û perwerdekirin. Li Bakûrê Kurdistanê tê dîtin ku bêçandiya faşîzmê bûye tacîz û tecawîz. Îro tê dîtin ku li Tirkiyê û Kurdistanê polîtîkayên tecawîzê bi awayek pir dijwar pêş dikeve. Yên ku vî dikin jî zîhniyeta Dewletê ku di nav malbatê de tê meşandin. Mînaka herî berbiçav jî ku bi rojan di Raya Giştî de li ser bûyera bi êş hat nîqaşkirin bûyera Narîn Guran a 8 salî ku ji Amedê Gundê “Tavşan Tepeyê “ bû qurbana diyardeya tecawîzê a malbatê. Dibe ku bûyera Narîn hat eşkerekirin lê bi hezaran zarokên ku tên tecawîzkirin û kuştin hene. Yên ku vî dikin jî esker, polîs û karmendê dewletê ne. Li aliyekî Kurdistan tê dagirkirin li aliyê din jî destdirêjî li ser jin û zarokan tê kirin. Pir eşkere derdikeve holê tacîza ku tê kirin di şexsê jin û zarokan de li ser hemû Kurdan û civaka Tirkiyê tê kirin.

### Bajarên Kurd lê hene dibin hedefa Şerê Taybet

Taybet bajar û navçeyên ku kurd in û kurd tê de zêde ne, dibin hedefa dagirkeriyê ji wan jî Amed, Wan, Dêrsîm, Gever, Colemêrg, û Rojavayê kurdistanê wek Efrîn, Giri sipî û Serê kaniyê ku ji aliyê dagirkeriya Tirkityê ve hatine dagirkirin. Bi deste Dewletê fihûş, kokaîn û madeyên hişbir ku civakê bê hiş dike bi deste polîsan di nav civakê de tê belavkirin. Li bajaran hebûna malên fihûşê, li dibistanan jî tacîz û tecawûza li ser xandekaran jî her diçe zêdetir dibe. Li Kurdistanê Şerê Taybet li ser dû lingan tê meşandin. Yek tacîz û tecawîz û fêrkirina madeyên hişbir. Ya din jî di bin navê hezkirinê de hevaltiya bi leşker û polîsan re ciwanan ber bi fihûşê ve dibe. Dewlet bi xwe jî dibêje şûna ku “keviran davêje bila fihûşê bike” ev jî tê wateya ku dewlet ji bo ku ciwanan bixîne her cûre êrişan pêk tîne. Bûyerên tacîz û tecawûzê îro li Bakûrê Kurdistanê bi awayek dijwar berbelav dibe, bêçandiya destavêtinê dibe sedema xwe kuştina jinan.

### Li heremên dagirkirî de polîtîkaya tacîz û tecawîzê

Yek ji herêmên ku herî zêde bi çand û nasnameya xwe ve girêdayî ye û bi sala ne li hember her cûre êrişên dewleta Tirk têkoşîn dike, Rojavayê Kurdistanê ye. Dewleta Tirk ji bo ku li Rojavayê Kurdistanê, çawa ku li bakûrê Kurdistanê diyardeyên tacîz, tecawîz û madeyên hişbir berbelav kir. ji bo ku Rojava jî heman siyaset da meşandin û di serî de polîtîkaya dagirkirina axa herêmê kir. Îro li heremên ku hatine dagirkirin wek Efrîn, Girê Sipî û Serê Kaniyê jin rastî her cûre tundiyê tên taybet tecawîz û revandina jinan di rêjeyekî pir bilind de ye. Taybet li Efrînê Şerê Taybet di asta herî jor de tê meşandin. Yan tu bi sîstema heyî re bibî yek û bihelî an jî tuyê bê kuştin. Dewleta Tirk a dagirker di herêmên dagirkirî de madeyên hişbir derbasî axa Rojavayê Kurdistanê dike û di dibistanan de ciwanan dike amûrekî Şerê Tabet.

## Ji Pênûsa Jin

### Hişmendiya HTŞ`ê ji bo jinê xeter e

**Nehîr Pale**

28`ê Çile sala 2017`an Cebhet Fetih El-Şam, Cebhet Ensar El-Dîn, Ceyîş El-Sune, Lîwai El-Heq, Hereket Nûr El-Dîn El-Zenkî li hevdû kirin û bi navê Heyet Tehrîr El-Şam xwe îlan kirin. Cebhet Fetih El-Şam navê wan ê berê Cebhet El-Nusra ye û di nava HTŞ`ê de hejmara wan ê herî zêde ye. Cebhet El-Nusra rêxistina El-Qa,îde ya Sûrî ye. Colanî sala 2003`an li Iraqê tevlî Hereket El-Qa,îde dibe. Di encama vê yekê de em ê bibêjin ku hişmendiya El-Qa,îde niha Sûriyê birêve dibe. Ev zîhniyet tu carî jinê qebûlnake û wê her tim hewl bide ku dawî li hebûna jinê bîne. Li Afxanistan, Somal, Yemen, Iraq û gelek dewletên Rojhilata Navîn bi hişmendiya El-Qa,îde nêzî jinê dibin. Rêbazên ku li Afxanistan û Iraqê li hemberî jinê didin bikar anîn, piştî HTŞ`ê li Sûriyê serwer bû destpê kiriye zextê li jinê dike. Bi zimanê şidetê nêzî jinê dibin.

Jinên Sûriyeyê ji sala 2011`an ve ji ber şer û êrîşên li ser Sûriyê têne kuştin, tecawizkirin, revandin û koçber kirin. Piştî hatine Colanî wê jinên Sûriyê hîn zêdetir rastî tûndiyê werin û zagonên nû li ser wan were ferz kirin. Di navbera zîhniyeta HTŞ`ê û DAIŞ`ê de tu cûdayî nîne.

Li hemberî hişmendiya HTŞ`ê misoger wê bertek ji aliyê jinên Sûriyê ve derbikevin. Ji ber di hişmendî û çandê de cudahiya jinên Sûriyê ji hehdû heye. Her wiha li Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê jin di salên şoreşê de ciyê xwe di hemû qadan de girt, li hemberî zayendperestiyê dest bi têkoşînê kirin û daxwaza azadiyê dikin. Lêgervanên heqîqetê derdikevin holê û dixwazin xwe ji şikandina bi hezarê salan rizgar bikin. Jina Sûriyê qebûlnake ku mîna berê bijî, serê xwe bitewîne, bê bertek bimîne û di bin navê dîn de tişta dixwazin pê bidin kirin. HTŞ`ê dixwaze bi rêbazên Talîban nêzî jinê bibe, jinê di bin navê ol de ji her tiştî bide dûrxistin û mehrûm kirin. Eger ji destê wan were wê dawî li têkoşîna jinê bînin û mîna Talîban destpêbikin hemû sazî, komîte û navendên bi navê jinê bigrin. Dibe ku hîna fermî tu biryar nehatibe girtin lê bi destê jinan cilên reş li ser jinan belav dikin, bi komkujiyên li Beravê destê xwe dirêjî jina Elewî kirin, ew revandin û bi awayekî veşartî firotin. Mîna çeteyên DIAŞ`ê bi jinên Êzidî kirin HTŞ`ê jî veşartî bi jinên Elewî kir û wê di rojên pêş de destê xwe bavêjin jinên Kurd û Durzî jî. Tecawizkirin, firotin û kuştina jinan çanda wan a şer e. Çanda tecawizê ya li ser gel û jinan didin meşandin ji bo xwe serkeftin dibîn in. Zîhniyeta HTŞ`ê tecawizkirina jinê ye û dawî li hebûna wê anîn e. Li hemberî vê zîhniyetê eger jinên Sûriyê bêdeng û bê bertek bimîn in wê dîsa vegerin rewşa berê û nikaribin nirxên xwe biparêz in. Perwerdekirina jinan, ew birêxistin kirin, berferehkirina xebatên jineolojî, pirsgirêkên jinê çareser kirin, xwedî li jinan derketin û xwe gihandina hemû jinên cîhanê wê jinên Sûriyê ji qirkirine biparêz e.



# ‘Çand û huner bingeha nasnameya mirovî ye’

Hevseroka Desteya Çandê ya Kantona Cizîrê Firyal Çolî bi bîr xist ku rola paradîgmaya Rêber Apo ya Netewa Demokratîk asta çalakiyên hunerî xurt dike û got, “Pêwîst e parastina çand û hunera hemû pêkhateyan were kirin."

**Argêş Vîyan/Qamişlo**

Desteya Çand û Hunerê ya Kantona Cizîrê bi damezrandina Rêveberiya Xweser di sala 2014’an û heta roja îro karê xwe berdewam dike. Gelek navendên girêdayî Desteya Çand û Hunerê ya Kantona Cizîrê hatin avakirin. Mînak navenda Şûnwaran xebatên xwe dike. Her wiha navenda muzîkê ya ji bo zarokan a bi navê Orkêstra heye.
Di derbarê xebatên hunerî yên Bakur û Rojhilatê Sûriyê û plansaziyên wan yên dema pêş de, Hevseroka Desteya Çandê ya Kantona Cizîrê Firyal Çolî ji rojnameya me re axivî.

### ‘Em bi kelecanekê mezin ya çalakiyên hûnerî Banga Aşitî û Civaka Demokratîk didin danasîn’

Hevseroka Desteya Çandê ya Kantona Cizîrê Firyal Çolî da xuyakirin ku erka wan ya sereke ew e ku danasîna berhemên şoreşa Rojavayê Kurdistanê ye û wiha dest bi axaftina xwe kir: “Em weke endamên desteya çandê ya herêma Cizîrê projeyên xwe yên salê lidardixin. Li gor derfetên di destê me de em hewildidin çan û hunera Kurdî û deskeftiyên şoreşa Rojava bidin naskirin. Me di bin piştgiriya sazî û desteyên çandî gelek mihrîcan û festîval li bajarên kantona Cizîrê pêkanîn. Mihrîcana 10’emîn ya çand û hunerê ya Jin, pîrozbahiyên Cejna Ekîto ya pêkhateyên Siryanî, cejna Çarşema Sor ya Êzîdîyan û hwd. gelek mihrîcan û şahiyên wiha



**Firyal Çolî**

lidarxistin. Ji ber ku projeya ‘Netewa Demokratîk’ ya ku Rêberê Gelan Rêber Apo pêşxistiye, hembêzkirina çand û kevneşopiyên hemû ol û baweriyan e. Hemû pêkhate, bawerî û çandên cuda yên Bakur û Rojhilatê Sûriyê de jiyan dikin mafên wan ji aliyê desteya çand û hûnerê ve tên parastin. Li gorî vê yekê jî em bi pêşniyar û plansaziyan weke xebatkar û hevserokên desteyê dikevin nava kar û xebatên hunerî de. Di nava vê salê de jî, festîvala wêjeyî li baxçêyê xwendinê hat lidarxistin û ji nivîskar û hunermendên serkeftî re spasname û dîyarî hatin belavkirin. Di heman demê de li ser bîranîn û şermezarkirina komkujiya li ser gelê Ermenî di kantona Cizîrê li bajarê Hesekê û Qamişlo şano hatin pêşkêşkirin. Ji ber ku zarok pêşeroja civakê ne, peymangeha Mezopotamya bi navê “Zahûner” dibistanên hunerî yên zarokan hatin vekirin, li bin sîwana wan dibistanên hunerî de perwerdeya şano tên dayin. Herwiha navenda muzîkê ya ji bo zarokan a bi navê Orkestra heye. Di heman demê de dîsa ji bona zarokên herêmê li Amûdê, Şedadê pêşengeh û şahî ji bona zarokan hatin pêşkêşkirin.”

### ‘Em ê çalakiyên hunerî berdewam bikin’

Firyal Çolî da xuyakirin ku ew hewild didin astengiyên li pêşiya karê wan dibin asteng derbasbikin û wiha berdewam kir: “Em ji bona dubarekirin û kêmahiyên asta çalakiyên hundirîn de kêmekê lewaz man û em ê weke desteya çandê li ser pêşxistina wê bisekinin û plansaziyên karê dema pêş bi rengekî hîn xurtir pêkbînin. Guhertina cih, vexuendina hunermendên Kurd yên cûda û hwd. em li ser gelek plansaziyên demên pêş nîqaş dikin. Weke sala 2025’an li gor demên derbasbûyi hîn asta çalakiyan baştir bû. Mihrîcana Çand û Wêjê ya Jin, yek ji mihrîcana ku li baxçê Azadiyê li Qamişlo pêkhat û tevlîbûneke girseyi jêre çêbû. Ji aliyê naverok û tevlîbûnê ve, bi rastî jî yek ji mihrîcanên danasîna çanda Kurdî û deskeftiyên Rojava de mînakekê xebatên xweser bû. Ji bona rêjeya tevlîbûna çalakî û mihrîcanan zêde û xurt be, me wek deste pêşniyara guhertina cihên mihrîcana kir. Em êdî çalakiyên ku li Bakur û Rojhilatê Sûriyê tên lidarxistin, ne tenê heremî û xwecihî werin meşandin û hewil bidin ku bibe netewî. Mihrîcana Jin ya Sînemayê ya Nûjiyan û mihrîcana huner û wêjeya jin jî mêvan û hunermendên tevlîbûnê biyanî bûn û hewildan heye ku asta çalakiyên ku têne meşandin were xurtkirin. Di dema pêş de wê hevserok û endamên desteyê serdana saziyên Rêveberiya Xweser û Ragihandina Azad bikin, ji bona ku peywendiyên di navbera saziyan de xurtbibin û bi hevre hîn baştir alîkarbin û kar û xebatên hev bişopînin.”

### ‘Di demên pêşiya me de amadekariyên gelek çalakiyan tên kirin’

Firyal diyar kir ku amadekariyên wan yên di asta Bakur û Rojhilatê Sûriyê yên hunerî berdewam bikin û wiha qedand: “Di wê mehê de gelek karên hevbeş û xweser dê bên meşandin. Di 10’ê Cotmeha 2025’an de 9’emîn Pêşengeha Şehîd Herekol bi guhertina cih dê bê lidarxistin. Di vê pêşengehê de li gorî derfetan wê tevlîbûna weşanxaneyên derve û yên hundirîn pêkwere. 5’emîn mihrîcana nîviskarên zarokan dê bê lidarxistin. Di heman demê de jî pêşengeha Osman Sebrî wê bê lidarxistin. Bi Banga Rêber Apo ya “Aşitî û Civaka Demokratîk” re erkê ku dikeve ser milê me hîn girantirdibe û pêwîste li gorî wî jî kar û xebat were meşandin. Di meha pêşiya me de, wê gelek şevbuhêrkên hunerî û roja helbestan bê lidarxistin. Bi hevkariya Desteya Çandê TEV-ÇAND û Hîlala Zêrîn dê, di demên pêş de konserên gel bên lidarxistin û di van konseran de wê tevlîbûna gelek hunermendên Bakur û Rojhilatê Sûriyê û yên bîyanî jî beşdar bibin. Ev plansazî li ser asta 2 kantonan dê were organîzekirin. Pêşxistina asta çandî û hunerî li Bakur û Rojhilatê Sûriyê, pêşxistina civakê ye, ji ber ku kesayeta ku ji çanda xwe dûr be, di heman demê de bê nasname jî dimîne.”

# ‘Çanda azad bi perwerdeyeke azad tê meşandin’

**Ayşa Silêman/ Dêrik**

**Hevseroka Peymangeha Bilind a Hunerê Menal Mihemed Emîn diyar kir ku ev peymangeh ji bo vejînkirina çanda Kurdewarî bi rengekî ekademîke, ji ber ku çanda azad bi perwerdeyeke azad tê meşandin.**

Peymangiha Bilind a Hunerê di 17’ê Cotmeha sala 2024’an de li bajarê Dêrikê hat vekirin, îsal 54 xwendekar di peymaqngehê de dixwînin. Her wiha di peymangehê de sê beş hene beşê şano 13 xwendekarin, beşê mozîkê 22 xwendekar û beşê sînema 19 xwendekarin.
Di derbarê bidawîbûna sala xwendinê li Peymangeha Bilind a Hunerê Hevseroka Peymangiha Bilind a Hunerê Menal Mihemed Emîn ji Rojnameya me re axivî.

### Bidwabûna sala xwendinê

Menal Mihemed Emîn da zanîn ku sala yekem ji xwendina Peymangeha Bilind a Hunerê ber bi dawî ve diçe û xwendekar ezmûnên xwe pêşkêş dikin û wiha got: “ Heta astekî ev sal serkeftî derbas bû, lê hewildanên me hene ji bo salên pêşiya me ku deha zêdetir serkeftî bê û gavên baştir werin avêtin. Perwerdeya ku di peymangehê de tê dayîn bi rengekî akademîk, armaca ku em ji bo wê kar dikin ew e ku xwendekarên me yên ku xwedî xwestek û hêvî di milê hunerê de ku bi rengekî ekademîk perwerdeyê bibînin. Di ezmûnên werzê duyem de asteke baş tê diyar kirin ku bi rastî jî gelek kêmayî hebûn û hatin derbas kirin. Di heman demê de ezmûn jî bi rengekî ekademîk tên meşandin, di milê bernameya ezmûnê de me xwest em hevsengiyê pêkbînin û ezmûnek tewrî û yek piratîkî da ku giranî li ser xwendekaran çênebe û bikaribin serkeftî ezmûnên xwe derbas bikin. Ji bo sala xwendinê ya nû ku em amadekariyan dikin ku du beşên nû vekin, ew jî beşê wênesazî û govendê haziriyê wan tên kirin wek cih, alavên pêwîst jî tên peyda kirin û mamosteyan jî hazir dikin.”

### Xwendekar hêviya me ya pêşerojê ne

Menal Mihemed Emîn axaftinên xwe berdewam kir û wiha got: “Em ber bi dawiya salê ve diçin wek salek destpêkê bi derfetên kêm gavên gelek mezin hatin avêtin bi taybet peymangehek bi vî rengî li ser axa Rojavayê Kurdistanê ku mirov dixwaze perwerdeyeke çandî bi rengekî akademîk bidê meşandin, helbet wê kêmasî û zehmetiyên wê jî hebin. Di destpêkê de henek kêmasî di milê metiryalan û kêmbûna mamosteyan de hebûn, lê bi demê re ev yek hat derbas kirin, di heman demê de komîte hat hazir kirin ji bo minhacê sê salên xwendinê. Tevî ku tecrûbeya yekemîn bû ji bo vejînkirina çanda kurdewarî bi rengê ekademîk, ji ber ku em tekez dikin ku çanda azad bi perwerdeyeke azad tê meşandin em hewildidin wê hevsengiyê çêbikin di milê perwede, zanist û hunerê ku hev temam bikin. Da ku xwendekarên ji peymangehê derbiçin ser çandek azad û peradîgmeke azad ku pêşerojê bi rêvebibin. Ji ber ku ew hêviya me ya pêşerojê ne ku bikaribin vê çanda ku welat xwe li ser didin ava kirin bi rêve bibin. Perwerdeya me ne tenê perwerdeyeke pisporiye, lê belê perwerdeyeke çandî, exlaqî û insanî ye ku bi rastî jî xwendekarên me di her awayî de temam be.”


### Bernameya ji bo sala bê

Hevseroka Peymangiha Bilind a Hunerê Menal Mihemed Emîn axaftinên xwe bidawî kir û wiha got: “Piştî qedandina werzê duyem di navbera havînî de bernameya me heye him di milê qeydkirina xwendekarên nû ji bo sala xwendinê, em ê heftiyekî şêwazê hevdîtinê ji xwendekaran re bidin nasîn da ku dema têsta hevdîtinê çêbibe hazir bin û him jî ji bo xwendekarên me yên ku wê derbasî sala duyem wek dibistana havînî wê were çêkirin ku mamoste ji derve jî



tevlî bibin da ku perwerdeyê bidin xwendekarên me. Ji bona ku kêmasiyên ku îsal bi me re derketin sala bê dernekevin. Hêviyên me gelek mezin in û em tucarî bê hêvî najîn di milê çêkirin û sererastkirina perwerdeyê de her li pêşin, bi taybet dema em derbasî nav xwendekaran dibin coş û xwesteka li cem wan hîn bêtir hêviyên me mezintir dike. Daxwza me ew e ku her kes were serlêdana peymangeha hunerê bike û perwerdeya ku tê dayîn bibîne ku bi çi rengî ye û li ser çi esasî xwendekar tên perwerde kirin. Her kes zanibe ku bi rengekî ekademîk çanda kurdewarî tê vejîn kirin, bi rengekî ku em hewil didin tecrûbeya cîhanê hemûyî nasbikin û li gor paradîgma xwe li peymangehê pêk bînin, perwereya netewa demokratîk ji bo hişmendiyeke azad, mirovek azad û pêşerojeke azad em dixwazin her kes vê nas bikin û hemû bi hev re destekê bidin hev da ku em çanda xwe ji cîhanê re bidin naskirin û biparêzin.”

## Têbînî



### Çima Zagona Çapemenî û Weşanê li herêmê nîn e

**Kemal Necim**

Li Rojavayê Kurdistanê her sal weke van çaxan, ango mehên hevînê xebatên weşan û çapkirina pirtûkan zêde dibe, ji ber ku weşanxaneyên li herêmê amadekariyên pêşangeha salane ya pirtûkan dikin, ku di destpêka payizê de tê lidarxistin. Bi zêdebûna xebatên weşan û çapkirinê dîse mijara başî û kêrhatina naveroka pirtûkên ku têne çapkirin derdikeve pêş. Di vê mijarê de her sal gelek gilî û gazin tên kirin ku naveroka gelek berhemên ku têne weşandin ne baş e, yan ne li gor rêzik û hêman û pîvanên zanistî, hunerî û wêjeyî ne. li ser van gilî û gazinan pirsa gelo çima Zagona Çapemenî û Weşanê li herêmên Rêveberiya Xweser tune ye, weke ku li gelek dever û welatan heye.

Li gorî gelek nêrîn û boçûnan hebûna Zagona Çapemenî û Weşanê li welatekî yan rêveberiyekê pir girîn e, ji ber gelek sedeman, ji wan sedeman ku ev zagon dikare sînorên derbirînê ji bo kesan destnîşan dike ku karibe boçûnên xwe derbirîne bêyî ku maf û azadiyên kesên din binpê bike. Zgaona Çapemenî û Weşanê rê li ber weşandin û belvkirina naverokên li dijî nirxên civakan digire, weke navrokên tundî û kîn û nefretê, yan jî agahiyên ne rast, yan jî êrikşkarî û binpêkirina taybetmendiya kesan. Her wiha ev zagon dê mafên afrêneriyê yên daner, nivîskar û weşangeran biparêze û dê bibe egera têvedana ber bi danîn û afrêneriya azad.

Ev tiştên me li jor anîn ziman li aliyekî, lê ya herî girîn li gorî gelek derdoran ku Zagona Çapemenî û Weşanê dê rê li ber weşandina pirtûk û berhemên qels û ne li gorî hêmanên zanistî û hunerî bigire. Ji ber di salên derbasbûyî de, bi dehan berhemên wêjeyê bi navê helbest, roman, çîrok û şano hatin weşandin, lê naveroka wan berheman pir qels û lawaz bû, çi ji hêla ramanê ve, çi ji hêla, ziman, hest, bedewî, huner û hêmanên din ên wêjeyê ve. Ji xwe ji ber ku rê û rêbazên çapkirina pirtûkan pir hêsan bûye, gelek nivîskar li benda weşanxaneyan namînin ku pirtûka wan çap bikin û biweşînin. Lewma her kes dikare destnivîsa xwe bibe cihekî çapkirinê û bi bihayekî arzan çap bike û bi xwe jî biweşîne û ahenga imzekirina wê pirtûkê jî li dar bixe.

Di rewşa heyî de, Dîwana Wêjeyê Ya Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê komîteyeke xwendin û nirxandina destnivîsan ava kiriye, ev komîte berheman dixwîne, dinirxîne û biryar dide ka bi kêrî çap û weşanê tê yan na. Hin sazî û weşanxane jî bêyî erêkirina Dîwana Wêjeyê pirtûkan çap nakin û naweşînin. Lê ti zagoneke fermî tune ku bihêle hemû sazî û her kes bêyî erêkirina Dîwana wêjeyê berhemê xwe çap bikin, ji ber ku zagon tune, xebatên Dîwanê jî nîvço dimînin. Pir girîng e ku saziyên têkildar, bi taybet meclisên zagonsaz ên Rêveberiya Xweser bi hevkariya desteyên çandê, yekîtiyên rewşenbîran û weşanxaneyên li herêmê, li gorî rewş û mercên herêmê destnivîsa Zagona Çapemenî û Weşanê amade bikin, bi derdorên têkildar re binirixînin û paşê jî bi fermî erê bikin da ku xebatên çap û weşanê li herêmê têkevin rêyeke tekûz û durist.

# Sîstema selikên paqijiya binerd rêya çareserkirina pirsgirêkên paqijiyê ye

Sîstema paqijiyê ya selikên binê erdê rêbazeke nûjen e ji bo parastina jîngehê. Ev sîstem li gelek welatên cîhanê tê bikaranîn, herwiha ji bo bidawîbûna krîza qirêjbûnê ya bajar û navçeyên Bakur û Rojhilatê Sûriyê ev sîstem dikare bibe riya çareseriyê.

Navenda Nûçeyan



**Projeya selkên çopê yên binerd**

Bi bêşketina bajaran û zêdebûna hejmara şîneyan, pêwîstiyek bi çareserkirina pirsgirêka çop û qirêjiyê, bi rengekî pêşketî û hevala ekolojî hebû.Yek ji giringtirîn van projeyên ku bi riya wê kirîzên jîngehê tên çareserkirin, projeya selikên paqijiy yên binê erdê. Ev proje teknîkek ku carê yekem li Ewropa bi taybet li Holendayê di salên 1990'î de hate pêkanîn û paşê li welatên Kendava Erebî û Asyayê, li pêş ket û belav bû.

**Rêbaza projeyê**

Avakirina tora selikên paqijiyê yên jêrerdê li deverên giştî, bazar, nav malan û hwd… tên danîn, destpêkê konçal ango kortikek tê kolandin paşê bi çîmentoyê tê batonkirin. Herwiha selkên paqijiyên ku ji hesin çêbûne tên bicihkirin ku tevgera wan jî, ango daxistin û hildana wan bi rengekî hîdrolîkî be (gerok ber bi jor û jêr ve). Di dawiyê de ev kortik bi lewheyekî hesin tê girtin, tenê deverke vekirî dimîne û şêweyê selikeke biçûk jê re tê çêkirin da ku mirov bi riya wê qirêjê bixe selika binerd. Derxistina selikan ji bo avêtina çopê jî bi rengekî hîdrolîk derdikeve ew jî bi riya erebeyên paqijiyê yên xwedî hêzeke tevgerê ya hîdrolîkî ye.

**Armancan**

Di roja îro de mijara paqijiya jîngehê gelekî girîng e ji bo mirov ji ber ku gelek nexweşî ji ber qirêjiyê li mirov derdikevin. Armanc ji projeya selkiên binerd jî parastina mirovan ji nexweşiyan e, hem jî çakkirina wêneyê bajaran. Kêmtirîn lêdanên bînî û hûrik. Li aliyekî din armanc parastina çopê ji lawirên ku dikevin nav qirêjê û çopa hundirê selkên li kolanan û qirêjê li erdê belav dikin e. Armanca din jî xelaskirina şîneyên bajaran ji bêhna çopê ya ku dibe cihê acizî û bêhntengbûnê.

**Nimûneyên cîhanê û herêmî**

Holanda di asta yekem de navdar e ji bo bikaranîna sîstema selikên bin erdê. Di asta duyem de jî Spanya: Bi taybet Barcelona vê sîstem bi kar tîne. Heman demê Emîrat vê projeyê ji 2011'an ve bi kar tîne. Herwiha li Qeterê jî sîstema selkên binerd ji sala 2017'an ve tê bikaranîn. Li Idliba Sûriyê jî ev sîstem ji destpêka sala 2025'an ve di xizmetê de ye.

**Bakur û Rojhilatê Sûriyê hewcedarî vê sîstemê ye**

Radeya qirêjê li hemû bajar û navçeyên Bakur û Rojhilatê Sûriyê tê dîtin, gelek sedemên vê diyardeyê hene, ji van sedeman kêmbûna asta çanda paqijiyê li gel civakê, ya din jî kêmasiyên aliyên eleqedar weke şarederayan e. Lê diyardeya ku hîn asta gemarê bilind dike ew e ku bi hebûna selikên paqijiyê, gemar û qirêj li derdora selikan kom dibe, hin kesên ku li çopê dixebitin û lawir jî bi armanca bidestxistina xwarinê dikevin nav çopê. Di encamê de qirêj dikeve erdê û bêhna nebaş belav dibe, ev yek jî dibe sedema ku civak ji selikan aciz bibin û her malek selika li pêşiya mala xwe dûr bixe, ev yek jî ji ber şêweyê ne baş û bêhna ne xweş. Lewma jî hebûna sîstema selkên binerd sîstemeke herî baş e ku bi riya wê hemû pirsgirêkên ku em li ser axivîn, çareser bibin. Herçendî ev proje li herêmê tune bin û teklufeya madî jî buha be, şaredariyên hemû bajar û navçeyên Bakur û Rojhilatê Sûriyê dikarin sîstemeke wiha bipejirînin da ku ji gelek pirsgirêkan xilas bibin.

# 'Ji ber kêmbûna baranê berhemên çandiniyê kêm bûn'

Birûc Resûl/Qamişlo

**Xwediyên bexçeyên sebzeyan yên bajarê Qamişlo, cotkar û karkerên ku di bexçeyan de kar dikin diyar kirin ku kêmbûna baranê ziyaneke mezin gihand tevahî cûreyên çandiniyê, ji ber wê berhemên îsal yê sebzeyan jî pir kêm bûn.**

Li Bakur û Rojhilatê Sûriyê çandinî yek ji stûnên aboriya civakî ye. Ji ber têkçûna lîreya Sûrî û bilindbûna buhayê sebzeyên ku ji derve tên, gelek cotkar û kooperatîfên çandiniyê berê xwe dan çandina sebzeyan da ku rêgeza xwetêrkirinekê ava bikin. Lê belê ji ber ku di vê salê de baran kêm bû, zehmetiyên pir mezin hatin kişandin. Ev yek bû sedem ku sebze ji derva derbasî herêmê bibin.

Welatiyên bajarê Qamişlo Mûne Teban û Cûma El Abdullah ên ku di bexçeyan de kar dikin, her wiha xwediyê bexçeyê sebzeyan Mehmûd Osman Mihemed ji Rojnameya me re behsa rewşa çandinî û sebzeyan kirin.

Mûna Teban di destpêka axaftina xwe de wiha got: "Di vê salê de ewqas zehmetî di aliyê karê bexçeyan de derket. Ji ber ku barana vê salê pir kêm bû û encamek baş ji van sebziyan derneket. Em jî wek karkerên di baxçeyan de kar dikin zehmetiyên rojane dibînin. Her kes dizane ku rewşa aborî a herêma me pir zore, em jî dixwazin dema kar bikin vê rewşê hindekî baş bibe. Em ji seat 5`ê sibehê tên nav baxçê heya 2 nîvro û karê me giştî bi awayekî baş diqede, lê hêviya me ew e ku qezencekê ji vî karî bigrin da ku em bikaribin dabara jiyana xwe bikin. Em di sate de 3`ê hezar lêreyên Sûrî digirin, ev yek jî pir kême."





Mûne Teban



Cûma El Abdullah



Mehmûd Osman Mihemed

**'Çandinî sitûna sereke ya aboriyê ye'**

Di heman çarçoveyê de welatiyê bi navê Cûma El Abdullah da zanîn ku her sal zevî ji salên beriya wê cûdatire, eger barana zivistanê pir be wê zevî baş be, lê dema ku baran kêm be him zevî kêm dibe û him nirxê berheman jî bûha dibin û wiha berdewamî da axaftina xwe: "Îsal sebzeyên me bi nirxekî pir kêm tên firotin û em jî di vê rewşê de zerarê dibînin. Em wek cotkar şev û rojên xwe di van zeviyan de derbas dikin, da ku dabara jiyana xwe bikin. Lê mixabin wek van salên bê berhemin, em ti qezencê baş ji karê xwe nagirin. Di dawiyê de jî hêviya min ew e ku Rêveberiya Xweser a Demokratîk mazotê bi rêjeyekê baş bide kesê xwedî zevî, ji ber ku çandinî yek ji sitûnên sereke ya aboriya civakê ye."

**'Pêwîste Rêverberiya Xweser destûr bide ku bîrên avê werin kolandin'**

Di heman demê de xwediyê baxçeya sebzeyan a taxa Um El-Fursan Mehmûd Osman Mihemed diyar kir ku ew zeviyên sebzeyên zivistan û havînî diçîne û wiha pêde çû: "Ez di erda xew yê çandiniyê de zebzeyên zivstanê û havînî diçînim. Bê guman her sal rewşa çanidiniyê cûde ye, mîna îsal barîna baranê pir kêm bû, erd tî û zuha ma, dema ku me tovên sebzeyan çand her sebze derneket ji ber ku erd kên av û zuha bû. Dema ku di demsala zivistanê de baran baş dibare, berhemek baş ji van zeviyan derdikeve lê dema baran nabare bandoriyek neyinî li çandiniyê û hem li cotkar tê. Ji ber ku em jî tovan û dermanên parastina şinahiyê ji kuriman û kêzkan bi nirxekî buha dikirin. Di rewşa WEKE Îsal de ku zuhayî heye em ava bîran bikar tînin. Bêguman em zehmetiyan di vî aliyê de em dikşînin ku mazot zû bi zû li erdên çandiniyê nayê belavkirin. Di heman demê de, dem ku av kêm be û sebzeyên havînî jî hene, pêwîst e Rêverberiya Xweser destûr bide ku bîrên avê ji bo çandiniyê werin kolandin."

Mehmûd di dawiya axaftina xwe de wiha got: "Çandinî li aliyê Firatî û Cizîrê tê cûdakirina ji ber ku li aliyê Firatê ava çem heye lê li Cizîrê hemû li ser ava bîran û kehniyan ne. Em bi hêvîne ku rewşa çandiniyê li herêmê baş bibe û em berhemên baş ji bo gelê xwe derxînin."



# Kurd, Elewî, Durzî û Xiristiyan...Gelo hikumeta nû çi bi xwe re anî?

Piştî 14 salan ji aloziya ku li Sûriyê hat jiyankirin, gel bi hêvî bû ku jiyaneke bi ewle û aram pêk were. Gelo bi hatina hikumeta veguhêz a Şamê re ev hêvî pêk hat?

Esma Mistefa/Qamişlo



**Hikumeta nû çi bi xwe re anî?**

Sûriyê bi hatina hikumeta veguhêz a Şamê re ku di 8'ê Kanûna 2024'an de derbasî qonaxeke nû bû. Di vê dîrokê de Rêjîma Eseed hat hilweşandin û li şûna wê hêzên bi navê HTŞ'ê serweriya xwe li ser tevahî Sûriyê di roj û şevekê de kirin. Bi hatina Hikumeta nû re malbata Eseed bi temamî ji holê hate rakirin ku heyanê niha jî piştî derbasbûna zêdetirî 6 heyvan; tu agahiyên fermî ne li ser ragihandinê ne jî di asta navnetewî de li ser Eseed tên belavkirin û behskirin.
Rewşa gelê Sûriyê piştî hatina hikumeta nû ku weke ber bi ronahiya rojê ve here, û 14 sal ji kawos û talankirinan wê bi dawî bibe bû. Ev yek helbet ne tenê hêviya gelên Sûriyê bû, hêviya tavahî pêkhateyên di Sûriyê de bû jî. Lê Tişta ku hatiye dîtin ew bû ku rewş ber bi talanmayîneke zehmetir ve birêve çû. Ev yek jî bi zihniyeta nijadperest, olperest a ku di mejî û dilê komên çekdar yên weke ku Sûriyê ji xwe re rizgarkirine de diherike û hat meşandin.

**Armanckirina gelê Kurd**

Bi tayebt em dixwazin balê bikşînin ser komkujî, talankirin û kiryarên ku bi hikumeta nû a
Şamê re hatiye ye. Di asta yekemîn de beriya her tiştî û her devrê berê xwe dan herêmên gelê Kurd. Bi ferizkirina serweriya xwe li ser Sûriyê de weke ku tolhildaneke û divê rakin, weke ku kîneke û divê wê kîna xwe li ser gelê Kurd rihet bikin, komên çekdar bi derbasbûna xwe ber bi herêmên gelê Kurd ve ev yek kirin. ji wan deveran yek her du daxên Kurdan yên Helebê; Eşrefiyê û Şêxmeqsûd bû ya din jî herêma Şehabyê bû. Di herêma Şehbayê bi taybet de piraniya wê gelê Efrînê lê jiyan dikin ku di sala 2018'an bi darê zorê ji ber êrişên dagirkeriya Tirkiyê berê xwe dan herêma Şehabyê û zêdtirî 6 salan li wir jiyaneke nû avakirin.
Şehba; Di 12'ê Kanûna 2024'an de komên çekdar ji Helebê berê xwe dan herêmê, her wiha ji ber herêma Şehbayê herêmeke dorpêçkirî ye, çeteyên li Efrîn û Ezazê wan jî ber xwe dan Şehbayê, bi vê yekê re xwestin gelê Kurd di wir de di komkujiyên qirkirinê re rû bi rû bihêlin. Rûxmî şerekî giran lê ev yek nebû, di encama li hevkirinan de gelê Kurd û yên Şehbayê ji herêmê derketin û berê xwe dan herêmê Bakur û Rojhilatê Sûriyê. Her wiha ji bo gelê Helebê bi heman lihevkirinan gel parastina xwe di taxê de kir û derneketin.

**Komkujiyên li ser gelê Elewî**

Mezheba Elewî beşek girîng ê tevna civakî ya Sûriyeyê ye, û xwedî dîrok û şaristaniyeke dirêj e ku dîroka wê vedigere sedsalên dirêj. Di avakirina deverên çandî, hunerî û siyasetê de li Sûriyeyê rolek gitrîng lîstiye. Lêbelê, rûxmî wê jî di aliyê civakî, siyasî, aborî de bi gelek zehmetiyan re rû bi rû dimîne.
Rêjeya Elewiyan li Sûriyeyê di navbera ji sedî 10 - 13 ji nifûsa giştî de ye ku wan dike duyemîn koma olî ya herî mezin piştî Sunnîyan. Li gorî texmînên Ajansa Penaberan a Yekîtiya Ewropayê ya ji bo sala 2020'an, hejmara wan ji du milyon kesan derbas dibe.
Bi hatina hikumeta nû re ev civak kete hedefa komên çekdar yên di nava hikumeta nû de. Yek ji sedeman jî ji ber Malbata Esed Elewî bûn û di Sûriyê de xwedî cihekî taybet bûn. Di heyva Adarê de ev civak rastî komkujiyên dijmirovî li beravên Sûriyê hatin ku di navbera 6 û 10'ê Adarê de li gorî ku hatiye belgekirin zêdetirî 1500 kes hatin qetilkirin, di nav wan de jin û zarok jî hebûn. Ev yek bi hinceta ku bermahiyên rêjîma berê ne hat pêkanîn. Hêjayî gotinê ye ku heyanî niha kesên ku ev qetlîam kirine, bê ceza mane. Û li gorî ku hatiye lêkolînkirin bi tirbeyên giştî hatine veşartin.

**Ajansa Reutrersê di 30'ê Hezêranê de ev yek eşkere kir**

Piştî bûyerên xwînî yên ku di Adara 2025'an de li herêma peravê ya Sûriyê qewimîn. Di lêkolîneke rojnamevanî a Ajansa Reutersê ya berfireh de ku di 30'ê Hezîrana 2025'an de hat weşandin, hûrgiliyên "kampanyayeke kuştina mezhebî ya sîstematîk" ku sivîlên Elewî hedef digirt eşkere kir ku di navbera 7 û 9'ê heman mehê de di tenê sê rojan de, bi qasî hezar û 500 kesan jiyana xwe ji dest dan.
Her wiha di rapora Ajansê de ev yek hate aşkerekirin ku Ehmed El Şera got ku 200 endamên hêzên hikumetê hatine kuştin. Her wiha Hikumetê hejmara kuştiyên sivîlên Elewî eşkere nekiriye.

Êrişên li ser Durziyan

Durzî li Sûriyeyê bi qasî ji sedî 3'ê nifûsa giştî pêk tînin. Hejmara wan di navbera 700 hezar û 1 milyonî de tê texmînkirin, û piraniya wan li parêzgeha Siweydayê ne. Ev civak jî ji êrişên kîn û nefretê yên olperest û nijadperest nehatin veqatandin.
Hêzên girêdayî HTŞ'ê şeva 28'ê Nîsanê bi çekên giran li dijî herêma Jaramana ya başûrê Şamê êrîş dan destpêkirin. Ev êrîş tenê bi Jaramana re sînordar nema û heta Sahnaya, Eşrefiye û Siwêydayê belav bû; bi dehan sivîl di van êrîşan de jiyana xwe ji dest dan.
Ev êriş û komkujî bi vîdiyoyekê hatin destpêkirin we jî; ji aliyê MÎT û HTŞ'ê ve aqilê çêkirî hat bikranîn û dîmekî ku heqeretê li Hz. Muhammed dike wekî aîdê serokê Durzî Marwan Kiwan e amade kirin û weşandin. Piştre êrîşa li dijî gelê Durzî dest pê kir. DAÎŞ'î û cîhadîstên biyanî yên di nava HTŞ'ê de, piştî êrişên xwe yên li ser xwendekarên Durzî yên li Humus û Şamê şeva 28'ê Nîsanê bajarê Jaramana ya girêdayî Siwêdayê hedef girtin û bi dehan sivîl qetil kirin.
Li gorî BBC li ser malpera xwe belavkiriye ku li gorî bîlançoyeke nû ya ku ji aliyê Çavdêrgeha Mafên Mirovan a Sûriyeyê ve roja Pêncşemê hatiye weşandin, di du rojên pevçûnên mezhebî de li Sûriyeyê ji 28'ê Nîsanê heyanî 1'ê gulanê, zêdetirî 100 kes hatine kuştin û bi dehan kes jî birîndar bûne ku piraniya wan şervanên Durzî ne.

**Komkujiya li ser Xiristiyaniyan**

Komkujiyên ku di Sûriyê de tên kirin tenê di vir de nehatin seknandin, di heman demê ev yek li ser gelê Xiristiyanî jî pêk hatin. Di êvara 22'ê Hezîranê, li Dêra Mar Elias a li taxa Douweyla ya Şamê êrişeke terorîstî pêk hat. Terorîstekî bombekirî ket hundirê dêrê, gule li ser îbadetkaran reşand û du re xwe teqand. Ev kiryara terorîstî bû sedema bi dehan kuştî û birîndaran. Helbet ev yek ji aliyê hikumeta nû ve hat redkirin ku tu agahiya wan ji vê bûyerê nîne û wê kesên ku ev yek pilan kirine bide ber cezayê. Lê pirs ne ev e; Pirs ew e ku heyanê kengî wê bûyer û komkujiyên bi vî awayî di Sûriyê de li ser gelên sivîl, pêkhate û mezheban werin pêk anîn? Hikumeta Sûriyê a nû li hember van kiryar û van sûcan berpirsyar e. Kê kiriye, ji aliyê kê ve hatiye pilankirin, divê hikumeta nû xwe li ber van bûyeran berpirsyar bibîne. Her çendî xwedî li van komkujiyan dernakeve lê li aliyê din hesabxwwestin jî nîne.

**Li Cinêfê Daxuyaniya Neteweyên Yekbûyî ku kiryarên "Ewlehiya Giştî" li Sûriyeyê şermezar dike û hesabpirsînê dixwaze hate derketin. Daxuynî jî bi vî awayî bû:**

Paulo Pinheiro, Serokê Komîsyona Navneteweyî ya Serbixwe ya Lêpirsînê ya li ser Komara Erebî ya Sûriyeyê, beriya civîna 59'emîn a Konseya Mafên Mirovan a Neteweyên Yekbûyî daxuyaniyek girîng da. Tê de şermezarkirineke eşkere ya "Ewlehiya Giştî" tê gotin li Sûriyeyê, li hember pêkanîna komkujiyan û hevkariyê di rûbirûbûna bi komên çekdar re, hebû.
Pinheiro girîngiya hesabpirsîna hemû berpirsan, yên ku beşdarî kuştina mirovên bêguneh bûne, tekez kir. Her wiha tawanên li dijî sivîlan, bi taybetî Elewiyan, li peravên Sûriyeyê hatine kirin.
Her wiha tekez kir ku pêwîst e civaka navneteweyî piştgiriyê bide rayedarên demkî yên Sûriyeyê di hewildanên wan ên dadweriya veguhêz û parastina sivîlan de. Yekkirina komên çekdar di nav artêşeke neteweyî de û misogerkirina ku binpêkirin dubare nebin. Pinheiro bal kişand ser pirsgirêkên sereke yên ku Sûriyê di nav de tundûtûjiya mezhebî û êrişên Îsraîlê yên li ser sivîlan. Her wiha rewşa girtiyan li Bakur û Rojhilatê Sûriyê. Serokê Komîsyona Lêpirsînê di dawiyê de bang li civaka navneteweyî kir ku pabendbûna xwe ya ji bo parastina mafên mirovan li Sûriyeyê xurttir bike. Û ji bo hesabpirsîna berpirsiyarên tawanan bixebitin.

**Piştî ewqas dem gelo helwesta Neteweyên Yekbûyî di cih de ye?**

Ev daxuyanî piştî derbasbûna ewqas meh li ser komkujî, kiryar, sûcên dijmirovî yên li ser pêkhate û mezhebên di Sûriyê de hatin pêkanîn, hat derketin. Li hember van mezheban û parstina hemû gelên di Sûriyê de Raya Giştî û Hêzên Navnetewî perpirisyar in. Gelo bi herikîna ewqas xwîn û kuştiyan, Gelo wê di Sûriyê de jiyaneke aştî, aram û demokratîk bê avakirin?

**Rakirina cezayên li ser Sûriyê di nava van qeyaran de çiqas rast e?**

Trump di meha Gulanê de ragihand ku ew ê li ser daxwaza Erebistana Siûdî, piraniya sizayên ku li ser Sûriyeyê ji sala 2011'an ve hatine sepandin, rake. Serokê Amerîkayê Donald Trump roja Duşemê bi fermî cezayên li ser Sûriyeyê rakir, bi hêviya ku welatê ku ji şer wêran bûye ji nû ve tevlî aboriya cîhanî bike. Di vê navberê de, Îsraîl dixwaze têkiliyên xwe bi Şamê re xurt bike, ku bi lez û bez pêşwaziya "biryara dîrokî" kir.
Sûriyê bi jiyankirina van komkujiyan û kiryaran û rewşa ne ewle a ku hemû jiyana gelên di Sûriyê de xistiye xeteriyê de, çawa di demeke wiha de cezayên li ser hatine sepandin, tên rakirin. Ger ceza bêne rakirin divê bi hemdemiya aramiya rewşa giştî a Sûriyê re be. Da ku gel bi aramî, aştî û gel faydayê ji van biryaran bigre ku rewşa aboriya Sûriyê baştir bibe. Lê rewşa Sûriyê hê di aliyê leşkerî û siyasî de negihiştiye rewşa aramiyê ku rojane komkujî, revandin, qetilkirin û talankirin tên jiyankirin. Ji lewra beriya her tiştî divê hesabxwestineke navnetewî li hember van sûçan bê kirin.

# ‘Serxistina pêvajoya‘Aştî û Civaka Demokratîk’ erkê hemû Kurdan e’

**Endamê Meclisa Edaletê ya kantona Cizîrê Nûredîn Şakir diyar kir ku kampanya “Ez dixwazim bi Abdullah Ocalan re hevdîtinê bikim” hêdî hêdî li tevahî cîhan û Kurdistanê belav dibe, tê xuyakirin ku ev kampanya pêşveçûneke mezin çêdike.**

**Stêrk Mihemed/Qamişlo**



Derbarê kampanya “Ez dixwazim bi Abdullah Ocalan re hevdîtin bikin” Endamê Meclîsa Edaletê ya kantona Cizîrê Nûredîn Şakir bersiva pirsên Rojnameya me da û hevpeyvîn wiha bû.

**Di 14 Gulanê de kampanya ku “Ez dixwazim bi Abdullah Ocalan re hevdîtin bikim” hatibû destpêkirin û niha bi awayekî girseyî tê meşandin, hûn vê kampanya ji bo azadiya Rêber Apo çawa dinirxînin?**

Kampanya “Ez dixwazim bi Abdallah Ocelan re hevdîtin bikim” dengvedanek di nava cîhanê bi giştî de ava kir. Ev kampanya ku di pilatforma aştî û azadî ya Ewropayê de hatiye destpêkirin, hêdî hêdî li tevahî cîhan û Kurdistanê belav dibe, tê xuyakirin ku piştgirtiyeke mezin ji vê kampanyê re tê kirin, bi hezaran kesên ku dixwazin tevlî vê qampanyê bibin hene û bi taybet kesayetên li Ewropa ew jî dixwazin hevdîtinê bi Abdulla Ocalan re çêbikin.

Berpirsyariya herî mezin dikeve ser milê gelê Kurd, pêwîste piştgiriyê zêde bidin vê kampanyê, ji ber ku banga Rêber Apo di demeke dîrokî de tê û pêwîste ku giranî jêre were dayîn, ku Rêber Apo ragihandina bi dawî anîna şer kiriye û bi vê banga xwe, qûnaxek nû ya Aştî û Civaka Demokratîk dest pê dike û êdî doza gelê Kurd li tevahî cîhanê hatiye naskirin, Niha dem dema aştî û civaka demokratîk e, biratiya gelan û netewa demokratîk e.”

**Gelo kampaniyek wiha heya çi astê dikare bandorê li cîhanê bike û zextê li ser dewlata Tirk bike?**

Kampanya ku “Ez dixwazim bi Abdullah Ocalan re hevdîtin bikin” bandorek mezin li ser tevahî cîhanê kir û bi taybet li ser Ewropayê kir, bi hezaran kesên ku xwesteka hevdîtinê bi rêber Apo re dikin û her roj xwesteka dîtina Rêber Apo zêde dibe. Herkes dixwaze hevdîtinê bi Rêber Apo re bike, ji ber ku hemû cîhan û bi taybet jî dewleta Tirk baş dizane ku ji bilî Rêber Apo xelasiya ji aloziyan û çareya pirsgirêkên di cîhanê tevahî de tuneye.”

**Tevî pêvajoya aştî û civaka demokratîk ya ku Rêber Apo dabû destpêkirin dewleta Tirk tu gav neavêtine, li hemberî vê pêvajoyê çi ji dewleta Tirk tê xwastin?**

Dewleta Tirk heya niha li hemberî banga Rêber Apo tu gavên berbiçav neavêtine, dewleta Tirk êdî mecbûre gavên berbiçav bavêje. Ji ber ku jê tê xwastin ku di zûtirîn dem de gav bavêje û erkên ku dikeve ser milê wê pêkbîne. Di nava dewleta Tikiyê de parçebûn çêbûye, beşek piştgiriya banga Rêber Apo dike û herwiha beşê din jî di siyaseta şer, qirkirin û tunekirina gelê Kurde bi israre û dixwaze pirsgirêka heyî bi riya şidetê çareser bike.

Dewleta Tirk êdî pêwîste tecrîdê li ser Rêber Apo rake. Ji ber ku heya roja îro tecrîd li ser Rêber Apo berdewam e. Xwediyê vê pêvajoya “Aştî û Civaka Demokratîk” heya niha di nava çar dîwaran de ye, kaniya Aştî, azadî, demokrasiyê heya niha di zindanê de ye. Rojhilata Navîn di nava qeyranan de jiyan dikir, Rêber Apo ev siyaseta qirkirinê bi dawî kir. Dewleta Tirk tenê bi gotin ev bang qebûl kiriye, lê li ser erdê di siyaseta xwe de tu guhertin pêknaniye û hîn jî li ser gel û civakê şerê taybet û derûnî dide meşandin.

**Ji bo pêkanîna azadiya fîzîkî ya Rêber Apo û serxistina pêvajoya “Aştî û Civaka Demokratîk” çi ji gelê Kurd û hemû gelên azadîxwaz tê xwestin?**

Gelê Kurd di vê dema dîrokî de, li pêşberî dîrokê de berpirsyar e. Azadiya fîzîkî ya Rêber Apo û serkeftina pêvajoya “Aştî û Civaka Demokratîk” divê erk û armanca her Kurdekî be. Rêber Apo çavê me li azadiya bîrdozî û fikrî vekir, Rêber Apo azadiya hemû gelan û netewan ji xwe re esas girt. Rêber Apo jiyana xwe bi kar û xebateke tijî û dagirtî ji bona azadiya gelê kurd û mirovahiyê derbas kir. Îro dem hatiye ku gel ji bo azadiya fîzîkî ya Rêber Apo xebat bike û pêvajoya ku daye meşandin temem bikin.

Pêvajoya ku Rêber Apo da ye destpêkirin divê dewleta Tirk temam bike û erkê ku dikeve li ser milê xwe pêkbîne, ji ber ku eger vê pêvajoyê qebûl neke, destekê nede û nemeşîne, wê rewşa Tirkiyê xerab bibe û riya xelasiya ji parçebûnê tune ye.

Bîrdozî û remanê ku Rêber Apo avakirî û pêşxistî riya herî guncave ji bona azadî û xelasiya hemû gelan. Ji ber ku li ser bingehê netewa demokratîk, wekhevî û biratiya gelan û qebûlkirina hemû netewan û avakirina civakeke demokratîk ji hemê cîhanê re ye.”

# ‘Siyasetên şaş zordariyê xurt dikin û piştgiriyê didin nefretê’

**Navenda Nûçeyan**

**Nivîskar û rojnamevanê Sûriyeyî Xalid El Serhan diyar kir ku hikumeta veguhêz a Sûriyeyê berpirsê parastina tevahî sûriyeyan e û got divê hikumet dev ji siyasetên xwe yên dawîn ên zordarî, xîtaba nefterê û nijadperestiyê berde.**



Digel zêdebûna xîtabên tehrîdkirinê û binpêkirinên yekser ên bifikar, li herêmên di bin kontrola hikumeta veguhêz a Sûriyeyê de binpêkirinên li dijî azadiyên olî û baweriyan berdewam in. Di vê dawiyê de li dijî taxên xiristiyanan ên Şamê binpêkirinên sîstematîk hatin kirin, weke hemeleyên propagandaya dijminane bi rêya spêkeran ku bang li xiristiyanan dikin ku bibin misilman û gefên yekser li wan dixwin.

Di 22`yê Pûşberê de li Dêra Mar Elyas a li herêma Diwêlayê teqînek xwekujî pêk hat, di encamê de zêdetirî 25 welatiyan jiyana xwe ji dest da û bi dehan birîndar bûn. Wezareta Karên Hundirîn yekser daxuyanî da û DAIŞ bi êrişê tawanbar kir. Lê koma “Saraya Ensar El Sunne” ya li herêmên hikumeta veguhêz çalak e, daxuyanî da û got wê êriş kiriye û gef xwar ku ew di demên pêş de êrişan zêde bike. Her wiha beriya wê jî di Nîsanê de li dijî dêra Mar Curcus a bajarokê Bilûdan a Şamê êrişek pêk hat û li dijî gelek dêran li herêmên din êrişên cuda çêbûn. Li ser malperên mediya dijîtal jî, li dijî durziyan jî gefên aşkera yên qetilkirinê hatin xwarin, li dijî ewlehî, cihên wan ên olî û çandî binpêkirin hatin kirin.

Ruetres’ê rêze komkujiyên hovane yên li dijî Elewiyan li Laziqiye û Tartûsê di Adara 2025`an de rû dane, aşkera kirin. Li gorî lêpirsîna ku ji hêla raporên NY’yê û şahidiyên xwecihî ve tê piştgirîkirin, di êrişên komên girêdayî hikumeta veguhêz de li dijî zêdetirî 40 cihî, hezar û 500 kes bi rê û rêbazên cuda hatine kuştin. Heta ev êriş gihîştin astên darvekirin, lîstina bi cenazeyan, qetilkirina jinan û zarokan û koçberkirina bi hezaran welatiyan û bicihkirina niştecihên ji mezhebên din li şûna wan. Ji berê metirsiyên rastîn hene ku demografiya herêmê bi awayekî berfireh were guhartin.

Ne tenê pîroziyên olî hatin hedefgirtin lê sembolên nîştimanî û çandî jî ji van êrişan nefilitîn. Di 2’yê Tîrmehê de, Peykera Şehîdan ji qada Sedallah El Cabrî ya bajarê Helebê ji cihê wê hate rakirin û demeke berê jî peykerê Selahedîn El Eyûbî ya li Şamê hatibû rakirin. Gelek mûzeyên hunerî hatin wêrankirin.

**Hesabxwestin û edaleta pêvajoya veguhêz pêwîst e**

Rojnamevan Xalid El Serhan têkildarî mijarê got: “Divê rêveberiya nû ya Sûriyeyê ewlehiyê û aramiyê bi cih bîne, azadiyên bingehîn di serî de azadiya baweriyê misoger bike. Divê hesabxwestineke cidî ji her kesê binpêkirin li dijî sivîlan kirine were kirin, rêyeke rastîn a edaleta pêvajoya veguhêz were vekirin. Sûcdarên şer neyên efûkirin û ji nû ve kesên di rejîma berê de sûc kirine venegerin ser kar.”

Li gorî El Serhan, ji aliyê hikumetê ve li dijî xîtaba nefretê û mezhebperestiyê, çi di aliyên siyasî yan jî çapemeniyê de dibe, kêmasiyên aşkera hene û divê ev yek demildest werin çareserkirin.

**Diyaloga niştîmanî ya berfireh**

Di dawiyê de El Serhan bang kir ku divê dev ji rêgezên şaş werin berdan, mîna “konferansa serkeftinê”. El Serhan ev konferans bi damezrandina desthilateke nû, hemwextî çûns Ehmed El Şeri li ser desthilatê wesif kir.

Di heman demê de El Serhan teqezî bi betalkirina “Danezana destûrî” kir û banga lidarxistina diyalogeke niştîmanî ya navxweyî ya rastîn kir û diyar kir ku ev diyalog divê ji ya Sibata borî ya li Şamê cudatir be, tevahî hêzên niştîmanî, bi taybet jî Meclisa Sûriya Demokratîk û Rêveberiya Xweser beşdar bibin.

Herî dawî El Serhan banga bicihanîna bendên peymana Adarê ya di navbera serokê hikumeta veguhêz a Sûriyeyê Ehmed El Şeri û Fermandarê Giştî yê Hêzên Sûriya Demokratîk (QSD) Mezlûm Ebdî de kir, di heman demê de daxwaza pêkanîna bendên wê ji bo yekkirina saziyên sivîl û leşkerî kir ku bi wê re welat derbasî qonaxa lihevhatina niştîmanî û aramiyê bibe.



## Bûyerên li dijî pêkhateyên Sûriyê, plankirî ye!

**Dilyar Cizîrî**

Di demên dawî de gef û êrişên li dijî pêkhateyên Sûriyayê zêde bûne. Ev bi êrişa li dijî Dêra Mar Ilyas a li Taxa Diwêla ya Paytexta Sûriyayê Şamê baştir zelal bûye. Hemwextî gefên li dijî xiristyanan, li paytexta Sûriyê Şamê, Heleb, Humis û deverên din binçavkirina ciwanên kurd, revandin û heta kuştin jî zêde bûye. Di çarçoveya hemleya wan a binçavkirina kurdan de hevalê me yê Rojnamevan Hesen Zaza û hejmarek xebatkarên tevgerên kurdan jî hebûn. Li Perava Sûriyê jî daristan bi zanebûn hatin şewitandin û bi hezaran hiktar dar, mal û milkên elewiyan hatin şewitandin. Di heman demê de bûyerên revandina jinên elewî û xwestina fidiyê ji malbatên wan ji raya giştî re aşkere bû.

Bûyerên li jor ku hemû jî li dijî gelê Sûriyê pêk tên, ne tesadife. Berûvajî ev bûyerên hemwextî hev ku li djî pêkhateyên gelê Sûriyayê pêk tên bi zanebûn û bi awayekî plankirî pêk tên. Em ji şewata li Perava Sûriyê destpê bikin. Li ser hin malperan belav bûye ku belgeyên veşartî hatine weşandin, planek heye ku ew herêm ji niştecihên wê bi temamî were valakirin. Li wir bi pereyên hin welatên ereb, pirojeyên turizmê ava bikin. Plana wan ji şewata herêmê destpê dike. Komeke çemdar a çêlîka DAIŞ’ê ku di bin avê “Ensar El-Sina” bûyer girt ser xwe. Bi vê jî dixwazin bi navê DAIŞ’ê û çêlîkên wê sûcdaran veşêrin. Gef û zextên li dijî dirziyên xwe li Siwêda bi rêxistinkirine û nakevin bin banê desthilatiya HTŞ’ê hîn jî zêde bûne. Bi van gefan jî dixwazin serê dirziyan bitewînin û pirojeyên xwe li ser wan feriz bikin.

Bûyerên girtin, revandin û kuştina ciwanên kurd li paytexta Sûriyê Şamê beşekî din ê mezin a plana wan e. Bi vê jî dixwazin zextê li QSD’ê û Rêveberiya Xweser bikin, wiha jî planên xwe bi zorê bidin qebûlkirin. Heta li dijî siniyên ne li gorî wan jî zext û zordarî tê kirin. Ev li Hema, Heleb, Şam û deverên din ên Sûriyê pêk tê. Ew jî beşekî a plana siyasî ya li dij gelê Sûriyê bi hemû pêkhateyên wê ye. Ev xalên li jor me rêz kirine, di demekê de gelê Sûriyê li bendê ye, çareserî û aramiya mayînde li tevahî xaka Sûriyê pêk were, têne kirin. Ev metirsînan hîn zêdetir dike, di heman dem de diyar dike hîn jî rayedarên Sûriyê di firka çareseriya demokratîk de ne pijiyane û newêrin di mijarên demokrasiyê de gavan bavêjin, ji lewra siyaseta xwe ya inkar, tunekirin, wêrankarî li dijî hemû pêkhateyên Sûriyê dimeşînin. Ya herî metirsiyan zêdetir dike, ev plan û bê cidiyeta rayedaran e.

Ew li hin gavên dîplomasî û hevdîtinên di asta qada navdewletî de meze dikin, dibêjin qey serkeftina mayînde bi dest xistine. Serkeftin bêyî beşdarbûna hemû pêkhateyên gelê Sûriyê ne pêkane. Îcar li ser wî esasî gavavêtina li ser riya civaka demokratîk baştirîn riya çareseriya demokratîk e. Li ser wî esasî jî ezmûna Bakur û Rojhilatê Sûriyê tekane riya pêkanîna çareseriya demokratîk e. Heger pêk neyê jî wê rê li ber wêranî û şerên navxweyî yên herî mezin vebe.



# ‘Hêzên navdewletî li gorî berjewendiyan têkiliyan bi Şamê re dikin’

**Serokê Navenda Kurdên Bêsînor Kadar Pîrê anî ziman ku hemû hêzên navdewletî li gorî berjewendiyên xwe danûstandinan bi hikumeta Veguhêz a Şamê re dikin û got, “Rewşa gelên Sûriyê wê xerabtir bibe, pêwîst e sîstema navendî were şikandin û sîstemeke demokrat ku mafê hemû kesî biparêze, ava bibe."**

**Hemza Sêvo/ Qamişlo**

Siyaseta her dewleteke ku danûsetndinê bi hikumeta Veguhêz re dike cuda ye, bi mercên cihêreng in, tevî kiriyarên xerab yên kom û hêzên hikumeta Şamê ya Veguhêz, ev yek jî kirîzê li hemberî çareserkirina pirsgirêka gelên Sûriyê kûrtir dike. Derbarê heman mijarê serokê Navenda Kurdên Bêsînor Kadar Bîrê bersiva pirsên rojnameya me da û hevpeyvîn wiha bû:

**-Piştî ketina rêjîma Baas û bi hatin hikumeta Şamê ya Veguhêz, çi guhertin li seranserî Sûriyê pêk hat?**

Bi ketina rêjîma Baas û hatina hikumeta Veguhêz a Şamê re em nikarin bibêjin ku guhertin pêkhat. Gelên Sûriyê li benda ruxandina rêjîma dîktator a Baas bûn û guhertineke bingehîn li Sûriyê pêk were, hêviya wan jî ku azadiya gelên Sûriyê pêk were. Lê mixabin rêjîma Baas bi teşeyê xwe hat guhertin, rêjîmê bi riya îstixbaratî û kesayetên ku sûd jê werdigirtin, Sûriyê bi rê ve dibirin. Rewşa niha hîna xirabtir e, serokê Sûriyê xwe ji bo serokatiya demkî hildibijêre, dema wê 5 sal in, lê ev yek dê mayinde be. Herwiha serokê Sûriyê hertiş di destê wî de ye, ew serokê leşkerî, aborî û hwd… e û nabe ku hesab jê were xwestin li ser biriyar û kiriyarên wî. Me dît ku destûrek di demeke kurt de derket, hem jî avakirina Meclisa Gel bi rengekî ji xweber bêyî hilbijartinan endamên wê hatin pejirandin, di serdema rêjîmê de hilbijartin çêbûn, lê hilbijartinên şeklî bûn, niha ew hilbijartin jî çênabin. Rewşa Sûriyê ber bi reşbûn û tarîtiyê ve diçe, eger ev sîstem wiha berdewam bike wê rewş xirabtir bibe. Ji ber ku hêviya gelên Sûriyê an jî pêşeroja wan bi sîstemeke wiha dimre û dixetime, ev yek jî bi riya tiştê ku li ser rûyê erdê dibe nîşan dibe ku çiqasî hikumet di siberoja Sûriyê dikare bibe cihê pêkanîna daxwazên gelên Sûriyê. Hikumeta veguhêz tenê ji bo berjewendiyên xwe û razîkirina dewletên xwe kar dike. Di heman demê de tu projeyên wê ji bo gelên Sûriyê, azadiya gelan û demokrasiyê tune ye, ev yek jî di baweriya me de nabe cihê hêviya gelên Sûriyê.

**-Hemû alî bi guman nêzî hikumeta Veguhêz a Şamê dibin, hem jî pêwendî û destekê didin vê hikumetê, gelo hûn vê yekê çawa dinirxînin?**

Bi hatina hikumeta Veguhêz a Şamê re her kes pêwendî û têkliyên xwe pê re ava kir û xurt kir, hem jî hate qebûlkirin ji hêla dewletên mîna Ewropî, Erebî, dewleta Tirk, Amerîka û hwd… Destpêkê em ji bîr nekin ku ev hikumeta nû bi piştgirtiya Israîl, Birîtaniya, Amerîka û dewleta Tirk pêk hat. Di roja îro de hemû hêzên navnetewî yên ku me ew bi bîr xistin, ji bo berjewendiyên xwe destekê didin hikumeta Veguhêz û ne xema wan e çi bi serê gelên Sûriyê tê. Qet carekê van dewletan bi gelên Sûriyê nehizrîn ku daxwazên gelên Sûriyê ji bo pêşeroja welatên wan çi ye. Di serî de da ku Israîl koka Îranê têk bibe û nexşeya Rojhilata Navîn li gorî xwe saz bike, destek da Colanî, hem jî Sûriyê û hêza wê ya leşkerî têk bir da ku heya 50 salî jî nikaribe li hemberî Israîlê rabe. Siûdiyê jî ji destpêkê de alîkar bû bi Colanî re, rewş dişopand, heta roja îro jî hewldanên wê hene ku rûyê Colanî veguherîne Ehmed Elşeri, ev yek jî ji ber metirsiya wê ji hebûna Îranî li Sûriyê, bêyî ku rewşa gelên Sûriyê bipirse ku çiqasî pêkhateyên Sûriyê wê bighêjin mafê xwe. Li aliyê din jî Amerîka û Birîtaniya jî armanca wan ew bû ku rêjîma Baas têk biçe, ev yek jî da ku hêza Îranê û Hizbullahê li Sûriyê û Lubnanê tune bibe. Li aliyê din dewleta Tirk têkiliyên xwe bi rêjîma Baas û hikumeta nû re jî xurtkirin tenê ji bo yek armancê, ew jî ji bo ku gelê Kurd negihêjin mafê xwe.

**-Di serdema rêjîma Baas û roja îro de jî her û her komkujî li ser gelên Sûriyê tên meşandin, hûn ji bo Sûriyeke demokrat ku mafê hemû gelan tê de parastî be, sîstemeke çawa guncav dibînin?**

Ji destpêkirina aloziya Sûriyê ve heta roja îro kuştin li ser nasnamê û mijarên olî û baweriyê pêk hat. Kuştin pêk hat ji ber ku tu sunnî yî, kuştin çêbû



ji ber tu elewî yî, kuştin çêbû ji ber tu Kurd î, ji ber tu Xirstiyan, Ereb û hwd… e. Li aliyekî din jî xîtaba kînê di navbera Kurd û Ereban de hat meşandin û gelek xebat ji bo xurtkirina vê yekê çêbû. Di roja îro de jî ev yek wiha ye, bingeha dadgeha veghêz tune ye li ser Sûriyê, ji ber ku yên ku komkujiyan li ser gelên Sûriyê pêk tînin, bi xwe dibin serwer li ser vê dadgehê, êdî wê çawa dadgeh û hesabxwestin bi cih bibe. Wekî em dizanin ev çar meh e ku komkujiyên tolhilandinê li ser Elewiyan pêk tê, ji bo vê mijarê jî Desteya Şopandina Rastiyan ji hêla hikumeta Şamê ve hat çêkirin, lê hîna vê saziyê tu encam dernexistine ji raya giştî re. Vaye hikumeta Veguhêz jî mîna rêjîma Baas kiriyarên xirab li ser gelên Sûriyê pêk anîn. Hemû pirsgirêk ji sîstema navendbûnê tê encamdan, heya ev desthilatdariya navendî neyê ruxandin wê komkujî li ser gelên Sûriyê bidomin. Lewma jî çareserî ew e ku mafê hemû pêkhateyên Sûriyê di destûrê de hebe, hem jî sîsema nenavendî, Rêveberiya Xweser ji bo hemû Sûriyê li gorî erdnîgariya wê bê avakirin, da ku gelên Sûriyê xwe bi rê ve bibin û pêşeroja xwe bi xwe hilbijêrin.

## Divê têkoşîna demokrasiyê xurttir bibe



**Zekî Bedran**

Hikûmeta nû ya Sûriyeyê bi berdewamî behsa yekîtî û yekparebûnê dike. Ev gotine ji bo kesên ku bi siyasetê re eleqedar dibin ne xerîb e. Yên ku li ser bingehek pir navendî û nîjadperest siyasetê dikin, yên ku li dijî demokrasiyê ne, pir caran serî li vê gotinê didin. Xetereya parçebûna Sûriyê heye? Na. Ma gel an beşên civakê hene ku dixwazin dewletek cuda ava bikin an jî cuda bibin? Na. Artêşa Tirkiyê hin axa Sûriyê dagir kiriye. Her wiha dagirkerî û destwerdanên Îsraîlê yên naskirî hene. Ji ber vê yekê, gelo hikûmeta Şamê qala vê yekê dike? Na. Hikûmeta Şamê heta niha di derbarê vekişandina leşkerên Tirkiyê ji Sûriyê de ti hewldan an daxuyaniyek nekir û nedaye. Berovajî vê, ew di rewşekê de ye ku dikeve bin baskê Tirkiyê. Hikûmeta Tirkiyê soz daye ku artêşa nû ya ku ew ê ava bikin perwerde bike, hwd. Hikûmeta Şamê bêyî wan hema-hema nikare ti gavan bavêje. Hêzên girêdayî HTŞ’ê nikarin bikevin herêmên ku ji hêla artêşa Tirkiyê ve hatine dagirkirin. Artêşa Tirkiyê tenê dikare bi qasî ku destûrê dide bi wan herêman re mijûl bibe. Sûriye veguheriye bazara vekirî ya Tirkiyê. Tirkiye di warê aborî de jî pir bi şans e.

Sedema rasteqîn a axaftina li ser yekîtî û yekparebûnê ew e ku pêşî li girtina daxwaza demokrasiyê ya gelê Sûriyê ye. Ew rêveberiyeke pir tûnd û navendî wekî yekane vebijêrkê pêşkêş dike. Yekîtiya herî xurt bi rêya jiyana bi hev re û bi awayekî azad û rêxistinkirî ya gelan e. Yekîtiya rasteqîn yekîtiya bi vîna gelan e. Ev yek azadiya raman û rêxistinê hewce dike. Divê bawerî û çandên cuda wekî dewlemendiyekê werin dîtin û neyên tepisandin. Destûra demikî ya ku ji hêla HTŞ’ê ve hatîye amadekirin, ti eleqeya wê bi demokrasî û pirrengiyê re nîn e. Hikûmeta demikî ya veguhêz tu eleqeya wê bi demokrasiyê û pirrçandiyê re tine. HTŞ’ê hewl dide ku her tiştê ku ji bo xwe guncaw dibîne bike. Gelê Sûriyê bi desthilatekê nû ya berdewemkirina hişmendiyekî olperest a rejîma Baasê re rû bi rû ye. Ger were gotin ku li Sûriyê şoreşek çêbûye, divê ev di pratîkê de jî xuya bik e. Divê hemû hêz, partî û tevgerên ku li dijî Baasê li ber xwe didin û demokrasiyê dixwazin beşdarê rejîma nû ya damezrandî bibûna. Lê, li şûna ku bi van hêzan re hevkariyê bike, HTŞ’ê armanc kiriye ku wan ji holê rake û rejîma xwe ava bike. Tiştê ku heta niha hatiye kirin, hewldanên ji bo avakirina rêveberiyek û pergalek e ku demokrasiyê ji holê radike û tenê berjewendiyên HTŞ’ê berçav digire ava dike.

Tirkiyê her tim Kurdan wekî gefekê ji bo veqetandin û dabeşbûnê di hundirê xwe de nîşan daye. Ji ber vê sedemê, hemû daxwazên rewa yên Kurdan red kiriye û tinehesibandin û tundûtûjiya xwe li ser vê bingehê ava kiriye. Qanûn û destûra xwe li ser vê paşguhkirina rêvebiriy e. Pergala Baasê jî bi awayekî cuda tevnegeriyaye. Wan jî Kurd paşguhkirine û bişaftineke hişk pêk aniye. Pergala Baasê li Sûriyê hilweşiya. Bê guman, bermahiyên wê yên bîrdozî û siyasî diviyabû werin derbaskirin. Lê, ev yek di hişmendî û pêkanînên HTŞ’ê de nayê dîtin. Ew hewl didin ku Kurdan û cudahiyên wan wekî gefek ji bo veqetandin û dabeşbûnê nîşan bidin. Kurdan qet daxwazek an jî xebatekî wisa nekirine ku ji Sûriyeyê veqetin û dewletek cuda ava bikin. Dema ku rejîma Baas’ê hilweşiyabû, wan daxwazek wisa nekir. Berovajî vê, wan dixwest pirsgirêkên xwe di nav yekîtîya Sûriyê de bi rejîma Baas’ê re çareser bikin. Baasê ev yek ne pejirand. Helwesta Kurdan niha jî wek berê ye. Ti daxwazên wan ên din nînin. Daxwazên wan demokrasî û pejirandina hebûna wan li nav xak û zagonên Sûriyê ne. Gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyê ku DAIŞ ji herêmên xwe de derxistin, xwe birêxistin kirin. Ewlehiya xwe misoger kirin. Sistemeke demokratîk ava kirin. Ji bilî vê, wan li dijî kesî şer nekir û êrîşî kesî nekir. Berovajî vê, ew di bin êrîş û gefên rejîma Baas û hêzên din, bi taybetî Tirkiyê de bûn. Hilweşîna Baas’ê ji bo Kurdan û baweriyên din, ji bo kesên ku demokrasiyê dixwestin, şans û derfetek pêşkêş kir. Li şûna ku vê yekê rast binirxîne, HTŞ’ê rêyek şopand ku Kurd û Rêveberiya Xweser ji holê rake. Li şûna hevkariyê, têkbirin hilbijart. Dema ku ev çênebû, hilbijartin kir ku wan armanc bigire û ji hev dûr bixe. Nîşaneyên vê yekê di gelek waran de têne dîtin. Heta pirsgirêkên ku dikarin bi goftûgoyan werin çareserkirin û baweriyê zêde bikin jî, li ser bingeha bazirganî û dijberiyê têne çareserkirin. Nûçeyên di saziyên çapemeniyê yên şerê taybet de cih digirin di rojên dawî de cih digirin li şûna ku baweriyê zêde bikin, bêbaweriyê kûrtir dikin. Tê ragihandin ku hin Kurdên ku çûne Şamê hatine girtin. Ev tê çi wateyê? Ev tê wê wateya ku hûn ê ji herêmên xwe dernekevin, hûn ê li Sûriyê siyasetê nekin. Ti tomet li holê tine. Pirsgirêk ev e ku ew Kurd in û mîna HTŞ’ê nafikirin. Ji bona Kurdan siyaset û rêxistinbûn li Sûriyê qedexe ye. Ev dikare wekî gef, çavtirsandin û dûrxistin û hwd. were binavkirin. Bê guman, ew pirsên wekî gelo li Sûriyeyê şoreşek hebû, ev çi şoreş e, û rastiya ku dilsozî û xebata hêzên demokratîk wekî sûc tê dîtin derdixe holê. Me gelek caran gotiye ku şoreşa li Sûriyê ji hêla HTŞ’ê ve hatiye dizîn û naveroka wê hatiye valakirin. Pirsgirêkên ku em niha pê re rû bi rû dimînin, nêzîkatiyên tiştên ku me di pratîkê de gotine ne. Eşkere ye ku em nikarin radestî van ferasetan bibin. Li dijî têkbirina şoreşê têkoşîn erkekê bingehîn e!!



## Hewldanên Bêrûmetkirinê

**Farûk Sakik**

Bi banga Rêber Apo re serdemek nû di têkiliyên Kurd û Tirkan de destpêkir. Herkes derbasî nav rûpelên dîrokê bû û di arşîvan de dest bi lêgerînê kirin. Behsa şerê Milazgirê kirin û hetanî damezrandina Komara Tirkiyê hatin. Di van têkiliyên dîrokî de hertim rêveberiyên Tirkan serdestbûne. Li gor berjewendiyên xwe bi Kurdan re serdemên bi mantiq derbas kirine. Roj hat êrîşên qirkirina Kurdan dane destpêkirin. Kurdan jî 28 caran li dijî van êrîşên wan serîhildane. Desthilatdarên demê her çiqas zilûmkarbûn jî rûmeta civaka Kurd rencîde nekirine.

Piştî komara Tirkiyê dîsa êrîşî Kurdan kirin û Kurdan cara 29’an li dijî wan serhildanek dane destpêkirin. Di 27’ê Sibatê de gotin 100 sal berê ew têkiliyên di navbera herdû gelan de qut bûye emê ji nû de bidin destpêkirin. Ev herdû gel çawa di dîrokê de bihevre bûne hêz û ev erdnîgariya qedîm parastine, îro jî li dijî hêzên hatine Rojhilata Navîn û gav bi gav nêzî Tirkiyê dibin dikarin biparêzin. Lê dîsa bi du hin leyîstikan ketine. Di nexşeriya çareseriyê de dixwazin Kurdan(PKK bû gel û ji bo vê yekê peyva ‘Kurdan’ bikartînim) rencîde bikin.

Navê hedefa vê nexşeriyê wek ‘Tirkiyeyek bê Teror’ hat bi nav kirin. Her wek Kurdan bi serhildana 29’an heta roja me “teror” meşandine. Terora dewletê ya li hember Kurdan vedişêrin. Em têgeha ‘Tirkiyeya bê Teror’ wek êdî li hember Kurdan teror pêkneynîn bixwînin. Lê gavek din pêşve çûn ji gerîla pozîsyona teslîm bûnê dixwazin. Bi dîmenên çekdanînê an jî teslîm kirinê dixwazin bi rûmeta Kurdan bileyîzin. Gerîlla û çek ji bo Kurdan pîrozin. Ev yek wê pêkneyê. Bi rojane li ser vê yekê nîqaşên mezin tên kirin. Çi diqewime em nizanin. Lê bi tişta ku em baş dizanin Rêber Apo tucarî wê rê nede van hewldanên wan yên rûmetşikandinê.

Li gor agahiyên tên parvekirin, wê gerîla sembolîk hin çekê xwe bişewitîne û bi daxwiyaniyekê bibêjin em derbasî qonaxek nû dibin. Ji îro û şûnde bi rêbazên demokratîk siyasetê bimeşînin. Evqas. Îroj heger ku ev dewlet di şer de biserneketibe, mafê wê nîne di pêvajoya destpêka aştiyê de, ji gerîla dîmenên têkçûnê bixwaze. Di nav dewletê de kesên maqûl tevdigerin vê yekê dizanin. Lê di nav artêşê de hin alî hene di şer de israr dikin. Van kesan di sala 2015’an de li ser navê Ergenekonê tevdigeriyan. Wan kesên di salên 90’î de li dijî Kurdan komkujî pêkanîbûn. Van kesan dizanin ku heger di nav herdû aliyan de aşitîyek mayinde pêk were, wê bê kar û bê statu bimînin. Van kesan di dema cemaatê de li zindanan demek mabûn û piştî AKP’ê di hilbijartinên 7’ê Hezîrana 2015’an de biserneket, van kesan ji zindanê derxist anî ji nû de di nav artêşê de ew erkdar kirin. Van kesan îroj li qadên Gerîlla li du provaksyonanin. Ew teqîna 6’ê Tîrmehê ku 12 esker mirin jî parçeyek leystika van kesên dijberê aşitiyê bû. Hênjî nehatiye zelal kirin ka van leşkeran bi wê gazê li wê heremê çidikirin. Dewlet ji bo van kesan îkna bike bi du dîmenên bêrûmetkirinê ketiye.

Van kesan wê li hemberê serdema nû gelek astengiyan derbixin. Lê hêz û qûdreta wan ya midaxlekirinê tuneye. Pêngava aştî û civaka demokratîk carcarna wê giran bimeşe, lê di dawî de wê encam bigire, ji tecrûbeyên berê dersên mezin hatine girtin. Li Başûrê Kurdistan çek şewitandin û daxwiyaniya komek Gerîla wê vê pêngavê derbasî qonaxek nû bike.